

LÊKOLÎNA ZANISTÎ ÇAWA TÊ KIRIN**HOW TO CONDUCT A SCIENTIFIC RESEARCH**

Mehmet YAVAŞ*

KURTE

Di mijara lêkolînên zanistî de yek ji astengiyên derdikeve pêşberî lêkolîneran kêmasiya rêbazeke lêkolînê ye. Lewra lêkolînên zanistî li gorî hin rêzik û rêgezan têne kirin. Gava lêkolîner van rêbazan nizanibin, nikarin bi awayekî baş û serkeftî ji nav karê lêkolînê xilas bibin. Bi mebesta sivikkirina barê lêkolîneran li ser vê mijarê gelek xebatên bi akademîyê re têkildar hatine kirin. Ev xebat di qada lêkolînê de ji aliyê lêkolîneran ve tîn emilandin. Lê bi kurdiya kurmançî me ti xebateke sistematîk a derheqê vê mijarê de nedîtiye. Ji lewre ev xebata me hewl dide ku vê valahiyê dagire. Armanca me di vê xebatê ew e ku xebata me di qada lêkolînê de ji bo lêkolîneran û nemaze ji bo xwendekar û lêkolînerên kurd ên naşî re bikêr be.

Peyvên sereke: Lêkolîna Zanistî, Rêbazên Lêkolîna Zanistî, Merhaleyên Lêkolîna Zanistî

ABSTRACT

One of the obstacles facing researchers in the field of scientific research is the lack of a research method. Because scientific researches are conducted according to certain rules and methods. When researchers do not know them or act accordingly, they cannot handle and finish the research work successfully. In order to alleviate the burden of research for new researchers, many studies have been done on research methods. Students and new researchers make use of them in the field of research. But in Kurmanji Kurdish we have not seen any systematic work on this subject. So our study is trying to fulfill this need. Our aim is to put scientific research methods into service for students and researchers, especially Kurdish speaking ones.

Keywords: Scientific Research, Scientific Research Methods, Steps of Scientific Research

* Xwendekarê Doktorayê; Zanîngeha Dîcleyê, Enstîtuya Zanistên Civakî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî
mehmetyavasteacher@gmail.com

DESTPÊK

Lêkolîna zanistî pêvajoya berhevkirina daneyan û analîzkirin û nirxandina wan e. Ji lewre ne karekî hêsan e, karekî dûvdirêj e û di hundirê xwe de hin zor û zehmetiyan dihewîne. Ji bo lêkolîn bi serkeftî bê meşandin û qedandin, bêgûman pêdivî bi rênîşanekê heye. Zanyarên xwedî-tecrûbe piştî gelek xebat û lêkolînan xwedî rêbazekê dibin. Lê ji bo kesên nuh dest bi lêkolîna zanistî dikin zor û zehmetiyên ku dertên pêş wan sivik bibin û xebatên wan bi serkeftî bidawî bibin pêwîstî bi rênîşeyek çidibe.

Her çiqas mirov dikare rê û rêbazên cûrbecûr bikar bîne jî, di lêkolînên zanistî de hin merhale hene ku lêkolîner heger li gor wan xebata xwe bimeşîne dê bikaribe xwedî li keda xwe derkeve, wextê xwe çêtir bikar bîne û bi lêkolîna xwe li derdorê zanistî bandorek mezintir bike. Heke kar li gorî hin merhaleyan bê senifandin û di her merhaleyê de tenê amedekariyên wê astê bîn kirin dê zor û zehmetiyên lêkolînê têk biçin.

Lewma em dixwazin di vê gotara xwe de lêkolîna zanistî çawa tê kirin bi merhaleyên wê vebêjin. Bi gelemperî merhaleyên lêkolîna zanistî ev in:

- I. ‘Helbijartina mijarê
- II. Sînorkirina mijarê
- III. Sazkirina hîpotezê
- IV. Amedekariya plana reşnivîsê (outline)
- V. Berhevkirina çavkaniyan
- VI. Xwendin û nîşe girtin
- VII. Bikaranîna daneyan û ceribandina hîpotezê
- VIII. Karê nivîsînê ‘¹

Niha em ê hewl bidin da ku yeko yako van merhelayan destnîşan bikin.

¹ Halil, Seyidoğlu, *Bilimsel Araştırma ve Yazma El Kitabı*, Güzem, İstanbul, 1995, r.39

I. Helbijartina Mijarê

Helbijartina mijarê wekî karê herî girîng ê lêkolînê tê qebûl kirin. Ji ber ku berîya her tiştî bi wê dest bi lêkolînê tê kirin, divê hêç acele neyê kirin. Lêkolîner çiqas giringî bide helbijartina mijarê, çiqas li ser bifikire ewqas baş e û ew ê paşê ewqas rehet bike.²

“Divê neyê jibîrkin ku nivê lêkolînê helbijartina mijarê ye. Weke karê pêşî divê lêkolîner li ser mijara ku dixwaze lêkolîn bike; gotar, pirtûk û tezan bibîne û bixwîne. Ev xalekî ansîklopediyê jî dibe. Bi vî awayî di derbarê berfirehiya mijarê, girîngî û çavkaniyên sereke de dikare xwedî pêşgahiyan bibe. Yek ji karên ewîlîn jî venihêrtina xetabên berê yê li ser mijarê hatine kirin e. Ev xebat ji bo lêkolîner dibe hem pêşgahî û hem jî dibe jêdera îlhamê.”³

Lêkolîner divê li mijareke wisa bigere û bibîne ku ew hem ji bo wî û hem jî ji bo mirovatiyê di dawîyê de encamên bifeyde bi xwe re bine. Divê lêkolîner meyl û xwestekên xwe berbiçav bixe û mijareke ku bala wî dikişîne helbijêre. Lewre mijara helbijartî divê bibe derman ji bo pirsgerêkekê ku li benda çareserîyê ye. Herwiha divê mijar wisa giring û pêwîst be ku lêkolîner, civak û zanist jê sûd û feyde bigre. Heger feydê lêkolînê ji mirovatî û lîteratura zanîstî re tune be, ne hewce ye ku tez û gotar û pirtûk bîn nivîsîn.

Ji bilî vê divê çavkaniyên derheqê mijara helbijartî têr û hêja bin. An na dê lêkolîn bi têkçûnê re rû bi rû bimîne.⁴ Heger çavkanî ji hedê xwe zêdetir bin dîsa dibe ku ev yek hin astengiyan derxe holê û an jî orjînalîya (resenîya) lêkolînê ji holê rake û bêqîmet bike. Li ser mijarê berê çiqas xebat, pirtûk, tez û gotar hatine kirin divê bîn tesbîtkirin. Ji bo vê yekê berî her tiştî kovarên hekemî û pirtûkxaneyên online (serxet, li ser înternetê) divê bîn li hev xistin. Wek mînak li ser malperên wekî “webofscience”, “sciencedirect”, “springer”, “googlescholar” “dergipark” û “yokakademik” û databasên pirtûkxaneyan (wek mînak: isam, worldcat, librarycolumbia) mijar divê bê lêgerîn. Dîsa divê lêkolîner xebata xwe li ser xebatên ku berê hatine kirin ava bike û bi wan re peywendîyeke xurt bi wan re saz bike. Divê

² Aydın Taş, *Araştırma Kılavuzu*, A Grafik, Diyarbakır, 2016, r.23

³ Halil Seyidoğlu, heman berhem, r.39

⁴ Aydın Taş, heman berhem, r.25

lêkolîner vê astê teqez bîne cîh; çimkî dibe ku mijar berê hatibe lêkolînkirin û heya cihekî pêdaçûnek li ser hatibe kirin an jî hatibe çareser kirin.

II. Sînorkirina Mijarê

Piştî tesbîtkirin û helbijartina mijarê divê lêkolîner mijara xwe bi sînor bike da ku bi hûrgulî bikaribe li ser wê bixebite. Divê mijar pir fireh neyê girtin. Eger ji firehiya mijarê re sînorek neyê xêzkirin dê lêkolîner nikaribe jê derkeve. Di merhaleya helbijartina mijarê de me gotibû ku lazim e hin xwendin (pirtûk, gotar û tez) bîn kirin da ku lêkolîner bizanibe kîjan aliyê mijare balkêş e û bikaribe biryara xwe bide bê ka kîjan aliyê mijarê derî li lêkolîneke kûr vedike. Wek nimûne heger em mijareke bi navê ‘‘edebiyata kurdî ya modern’’ helbijêrin, dê mijara me pir fireh be. Ji lewre divê ew bê sînorkirin. Em dikarin mijarê wiha bi sînor bikin:

- a) Pêşengên edebiyata kurdî ya modern
- b) Pênaseya edebiyata kurdî ya modern û qonaxên wê
- c) Edebiyata kurdî ya modern bi kîjan berhemê dest pê kiriye?
- d) Di edebiyata kurdî ya modern de helbestên serbest.
- e) Gelo Mehmed Êzûn pêşengê edebiyata kurdî ya modern e?
- f) Danberhevdana pêştirin romana kurdî û ya tirkî
- g) Di edebiyata kurdî ya modern de evîn/war/serleheng hwd.

Herwekî ku ji van mînakên dîyar e, sînorkirina mijarê dê karê lêkolîner hêsantir bike. Bi kurtasî mirov dikare bibêje ku heke ji mijarê re sînoreke fireh were xêzkirin dê ev yek karê lêkolîner zehmettir bike. Herwiha heke sînor pir teng be vê carê dê girîngî û pêwîstîya lêkolînê bikeve xetereyê.

III. Sazkirina Hîpotezê

Ji peşniyaza ku rastiya wê hêj nehatîye sîhêtî kirin hîpotez tê gotin. Yanê peşniyazên ku dikarin bîn piştrastkirin an redkirin wek hîpotez tên binavkirin. Hîpotez ji hevokê an jî ji pirsekê pêk tê. Divê hîpoteza lêkolînê bi ziman û ûslûbeke hesan û kurt bê dîyarkirin. Em dikarin bibêjin ku zanist prosesekî sazkirina hîpotez û ceribandin û teyîdkirina wê ye. Divê

her tez û gotar xwedî hipotez û îddîfayek be. Hîpotez rêyek e ku lêkolîner dibe encamekê. Ew xebatê birêkûpêk dike û alîkariya esehîkirina fikr û hizran dike. Bi saya hîpotezê lêkolîner xwedî perspektîf û nêrînekê dibe û ji rê dernakeve. Êdî ew dizane hêz û xebata xwe li ser çî û çawa bi kar bîne.

Niha em du mînakekên ku me li jor dabû wek hîpoteza lêkolînê nîşan bidin:

Mijar : Edebîyata kurdî ya modern.

Mijara Lêkolînê : Pêşengen edebîyata kurdî ya modern .

Hîpotez :Edebîyata kurdî ya modern xwedî dîrokeke kevn e.

Mijar : Edebîyata kurdî ya modern.

Mijara Lêkolînê : Di romana kurdî ya modern de war.

Hîpotez :Di romana kurdî ya modern de war nedîyar e.

IV. Amadekariya Plana Reşnivîsê (outline)

Ev plan ji bo bê zanîn ka lêkolîn dê çawa bê kirin tê amadekirin. “Piştî ku hîpotez jî tê sazkirin êdî dest bi karê berhevkirina çavkanîyan tê kirin. Lê ji bo lêkolîn birêkûpêk bê meşandin plana reşnivîsê (outline) divê bê amadekirin.”⁵ Di lêkolînê de dema mirov bixwaze hîn bike bê ka agahî û melûmat çawa bîn pêşkeşkirin, wê gavê pêdiviya mirov bi planekê çêdibe. Em dikarin wê wek pêşnaveroka lêkolînê binav bikin. Yanê di vê planê de em naveroka lêkolînê pêşya ku em dest bi lêkolînê bikin amade dikin.⁶ Lê ew ne nîhayî ye ango di pêvojoya berhevkirina çavkanî û melûmatan de em dikarin tiştên nuh lê zêde bikin an kurt bikin û hin guherînan li ser bikin.

V. Berhevkirina Çavkaniyan

Piştî amadekirina plana lêkolînê divê dest bi karê berhevkirina çavkaniyan bê kirin. Heta niha li ser mijarê çiqas xebatên zanistî wek lêkolîn, tez, gotar, pirtûk, kovar û hwd çî

⁵ Halil Seyidoğlu, heman berhem, r.43

⁶ Yusuf Kavakçı, *İslam Araştırmalarında Usul*, Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Ankara, 1982, r.14

hene divê bîn tesbîtkirin. Ji ber ku ew ji me ra dibin çavkanî û em dikarin wan ji bo çareserkirina pirsgerêka lêkolîna xwe bi kar bînin, divê em zehf girîngî bidin vê merhaleyê.

Carinan jî dibe ku lêkolîner bi xwe xebateke qadî bi rê ve bibe an jî bi hevdtin û anketan daneyên xwe bi dest bixe. Herwiha çavkaniyên tîn berhevkin divê bi mijarê ve têkildar bin. Hema çî derkeve pêşberî meriv bi kêrî lêkolînê nayê. Çavkanî divê ne pir ji dût ve, lê heya astek bi mijara lêkolînê ve têkildar be. An na, dê karê lêkolîner giran bike û heta ku dikarê wî ji rê jî derxê. Heger asta tîkiliyê pir fireh bê destnîşankirin îcar ixtimal heye ku lêkolîner gelek çavkanîyan li dervayê lêkolînê bihêle.⁷

VI. Xwendin û Nîşe Girtin

Ji aliyekî divê karê bidestxistina çavkanî û daneyan bê mêşandin û ji aliyê din ve jî divê karên xwendin û nîşe girtin bîn kirin. Herwekî ku tê zanîn her tişt ne hêjayê xwendinê ye; loma xwendina hûrbijarî pir giring e. Lê lêkolîner divê xwendineke çawa bike yanê çî bixwîne û kûderê û çiqas bixwîne? Wek bersiv; lêkolîner divê teqez hîpotez û plana reşnivîsê ji xwe ra bike rêber da ku bigihîje armanca xwe û wext û keda xwe îsraf neke.⁸

Agahî û malûmatên pêdiviya lêkolîner pê heye gişt ne di rûpeleke çavkaniyekê de ne. Her yek li derek an jî di rûpelekê cuda de ne. Lazim e gelek çavkanî bîn xwendin û nîşe bê girtin. Ev jî karekî zor û pir demdirêj e. Ji bo vê yekê dive lêkolîner hunera xwendina bilez, fonksiyonel û karîger hînbibe û wan bi kar bîne. Heger lêkolîner bikaribe van rêbazan bi kar bîne dê ji dem û kedê gelek teserrûf bike.⁹

VII. Bikaranîna Daneyan û Ceribandina Hîpotezê

Ev merhale derfeta kontrolkirina hîpotezê dide lêkolîner. “Dema çavkanî tê xwendin û nîşe tê girtin, ji aliyê din ve tê venihêrtin û kontrolkirin bê ka gelo agahiyên destketî hîpotezê bi çî awayî û çiqas piştrast dikin. Ji bo ku lêkolîn tişteki nû derxe holê û bigihîje encamekê, divê li ser vê mijarê darazeke (hukm) nihayî bê dayîn.”¹⁰

Di lêkolîna zanistî de piştî berhevkirina çavkanî û xwendina wan, karê herî giring analîzkirin, tehlîlkirin, dahûrandin, şirovekirin û nirxandina çavkanî û agahiyan e. Armanca sereke ne berhevkirin û nîvîsandina agahî û çavkaniyan e. Divê lêkolîner ji xwe

⁷ Halil Seyidoğlu, heman berhem, r.45-48

⁸ Halil Seyidoğlu, heman berhem, r. 48

⁹ Suat Cebeci, *Bilimsel Yazma Araştırma ve Yazma Teknikleri*, Alfa, Stenbol, 2014, r.81-83

¹⁰ Halil Seyidoğlu, heman berhem, r. 51

re bike armanc ku bi şîrovekirin û nirxandineke orişinal û resen) ji pirsgirêkekê re çareserîyekê bibîne an jî bi dane û peşniyazên xwe rê li ber lêkolînên nuh veke.

VIII. Karê Nivîsînê

Êdî piştî agahî û daneyên li ber destê me hîpotez û ramana sereke û yê din piştrast bikin, dor tê ser karê nivîsandinê. Lê ev nivîsandin ne ya nîhayî ye. Yanî hem li gorî rêzimanê û hem jî bi şêwazê serkeftî em nikarin şîrove û nirxandinên xwe di carekê de binivîsin.

Nivîsandina rapora lêkolînê karekî ne hêsan e. Ji xwe li gorî piraniya lêkolîneran merhaleya herî zor û zehmet karê nivîsandinê ye. Ev ast ji gelek lêkolîneran re karê herî zor tê. Carinan mirov ji bo destpêkirin û domandina nivîsê li benda îlhamekê dimîne. Lê mayîna li benda hatina îlhamekê daxwazê beyhûde ye. Çêtir e kîjan beş an çawa ji mirov re rehet tê ji wê derê dest bi nivîsê bike. Ne di carekê de, lê piştî gelek ceribandin û sereraskirinan metna dawî derdikeve holê.¹¹

Hin lêkolînerên naşî (bêtecrûbe) çî jî bikin nikarin dest bi nivîsandinê bikin. Gelek kes dibêjin: ez dikim nakim ez nikarim dest pê bikim. Yek ji sedemên vê yekê jî ev e: Ew dibin qey gerek pêşî beşa destpêkê bê nivîsîn. “Ne rast û durist e ku bi nivîsandina beşa *destpêkê* dest bi nivîsê bê kirin. Sedema vê yekê jî diyar e. Ne karekî hêsan e ku mirov berê nivîsandina rapora bingehîn bizanibe ka dest bi çî kiriye an jî gihîştîye kîjan *encamê*.”¹²

Divê wek reşnivîs (muswedde) dest bi karê nivîsandinê bê kirin. Fikr û raman bi awayekî bilez tîn rêzkirin. Di vê astê de kaîdeyên rastnivîs û rêzimanê, lêhatina peyvan û bedewiya ûslûbê ne pêwîst in bîn cîh. Beş bi beş dest bi nivîsandina dane û malûmatan tê kirin. Ji bo ku karê nivîsandinê neyê birrîn û ew nîvco nemîne divê tablo, grafîk û jêrenot di reşnivîsa dawî de bîn bicihkirin.¹³

Piştî karê nivîsandina malûmat, fikr û ramanan diqede, divê metna raporê ji serî heta dawiyê zûka bê xwendin. Metn ji aliyê ûslûb, lêhatina peyvan û kaîdeyên rastnivîs û rêzimanê tê kontrolkirin. Heke hewce be lê tê zêdekirin û hin jê tê kurt irin an derxistin.

¹¹ Suat Cebeci, heman berhem, r.178

¹² Halil Seyidoğlu heman berhem, r. 54

¹³ Halil Seyidoğlu, heman berhem, r. 53

Tablo grafîk, jêrenot û hwd. çi hebin tên bicîhkirin. Piştî van karan êdî dor tê ser nivîsandina beşa destpêk û encama lêkolînê.

Di lêkolînekê de karê nivisandina beşa kurte, destpêk û encamê zehf giring ê. Ji ber ku xwînêr beriya her tiştî dixwazin mijar û armanca lêkolînê hîn bibin, ewil tenê destpêk û encamê dixwînin. Lewma divê teqez kurte, destpêk û encama lêkolînê pir baş bên nivîsîn. Beriya her tiştî, divê di beşa ‘‘destpêkê’’ de mijar bi zimanekî zelal û aşkera bê vegotin û ravekirin. Herwiha divê di destpêkê de bersiva van pirsan jî bên dayîn:

- a) Ev mijar çima hat helbijartin?
- b) Çi feyde tê peyîtandin?
- c) Li ser vê mijarê lêkolîn û xabatên berê hatine çêkirin kîjan aliyên mijarê çareser kirine?
- d) Hipoteza lêkolînê çi ye?
- e) Kîjan metod û teknîk hatine bi kar anîn?
- f) Lêkolîn li ser kîjan çarçoveya teorîyê hatiye spartin?

Bi kurtasî dive lêkolîner di beşa destpêkê de çi, çawa û çima çêkiriye baş îzah bike da ku xebata wî balê bikişîne ser xwe û tesîrek li derdorê zanistî bike.

Her wiha beşa encamên lêkolînê jî bi qasî destpêkê girîng e. Di vê beşê de pirsgirêk careke din tê nasandin. Metodên hatine bikaranin, encamên hatine bidestxistin û bersiva pirsên ka gelo hîpotez hatiye peyîtandin an na tên vegotin û ronîkirin. Divê ne tenê behsa keşf û delîlên hatine bidestxistin benê kirin. Lê divê lêkolîner cîh bide şîrove, nirxandin û pêşniyazên xwe jî.¹⁴

Piştî beşa destpêk û encama lêkolînê tên nivîsîn, divê metn careke din ji serî ve bê xwendin û kontrolkirin.

¹⁴ Seyidoğlu, heman berhem, r. 55

ENCAM

Lêkolîna zanistî karekî ciddî ye û xwedî hin zor û zehmetiyan e. Me jî ji bo karên lêkolînerên naşî sivik bibin, ji demê teserrûf bikin û bi serfirazî lêkolîna xwe bi dawî bikin, mijara lêkolîna zanistî çawa tê kirin bi zimanê kurdî di bin van merhaleyên sereke de rave kir û nirxand.

- I. Helbijartina mijarê
- II. Sînorkirina mijarê
- III. Sazkirina hîpotezê
- IV. Amedekariya plana reşnivîsê (outline)
- V. Berhevkirina çavkaniyan
- VI. Xwendin û nîşe girtin
- VII. Bikaranîna daneyan û ceribandina hîpotezê
- VIII. Karê Nivîsînê

Eger lêkolîner li gor van merhaleyan tevgerê û lêkolîna xwe bi dawî bike dê bikaribe hem bi xwe feyde jê bigre û hem ji bo mirovatîyê bikaribe ji pirsgerêkekê re çareserîyekê bibîne an jî balê bikişîne ser mijarekê û tesîreke erênî li derdorên zanistî nîşan bide.

ÇAVKANÎ

Cebeci, Suat. (2014). *Bilimsel Yazma Araştırma ve Yazma Teknikleri*. İstanbul: Alfa.

Kavakçı, Yusuf. (1982). *İslam Araştırmalarında Usul*. Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları.

Seyidoğlu, Halil. (1995). *Bilimsel Araştırma ve Yazma El Kitabı*. İstanbul: Güzem.

Taş, Aydın. (2016). *Araştırma Kılavuzu*. Diyarbakır: A Grafik